# Jîn

Jimara şeşê | Heyva Çirîa Êkê 2006 | Vercinye, Emrîke | perê - 1


## Remezan



Nuke Remezan e. Ḧemî hevalêt min yêt Kurd bi rojî ne. Eve 14 sale ez wan dibînim wekî bi rojî. Eve he ez dibînim u min çend pisîar hene.

Hevalêt min li demê rojê çi tiştî naxwin u bi rojî dibin. Belê piştî meẍreb ew gelek xwarinêt dixwin. Min guh lê bî ku biserrman li demê Remezanê pitir xwarinê u vexwarinê dikirrin u dixwin ji ḧemî heyvêt dî yêt salê.

¿ ? Erê ev rêke baştir da miruv qedirê Xwidê bizanit? Erê mebesta rojîê ewe tu ne xwî yan tu bîra werîa feqîr u jara bikî? Heker kesek bi rojî bit çi cawazî heye heker bi şev bit yan bi roj bit? Ne baştir e heker bu dû sê roja me li gel miruv u hevalêt xu cejin kir ban u heker me Xwidê bu çakîê wî bu me supas kir ba? U ne çêtir e heker li heyva maî me cilik u xwarin u pare yêt zêde dan heval u miruv u cîran yêt feqîrtir in ji me? Buçî zêngîn hêş zêngîntir dibin u feqîr hêş feqîrtir dibin?

Ji berî nuke ez li gel maleka Kurd jîam. Spêdekê li demê Remezanê u piştî rojhelat, ez ji xew rabîm u jin u mêr dîtin têşt dixwar. "Ḧêl!" min gut, "Remezan xilas bî?" "Ne," jinkê gutê, "belê me serêt xu ne şîştî ye ji berî rojhelat, u ji ber hindê em evru ne bi rojî ne."

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe ku çend wextî ji rojhelat? Ma Xwidê ne bi reḧm e?

Ji berî dû sê sala li demê Remezanê ez u hindek hevalêt xu çûîne sîkê. Piştî hingê ewan pêşnîare kir em pêk ve biçîn bixwîn. Ez mam guhişî! "Hîn ne bi rojî ne?" min pisîar kir. Ewan gute min, "Ne, em ḧemî bê nivêj în u em ne şêîn bi rojî bîn. U pêtivî ye ew rojî yêt me negirtîn em bigirîn piştî Remezanê."

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe em ne şêîn 'îbadetê Xwidê bikîn heker em paqij ne bîn? (Xwidê em husa çêkirîn!)

Hevaleka min nesaxîa şekirê hey. Parêz e pêtivî ye ew bi rojî nabit çunku dê gelek nesax bit. Belê qebîlnekirî ye rojî bihêlit. U dîmahî hindek car pêtivî ye biçite xestê (u li Emrîke ew gelek giran e!) u mala wê di xema seḧeta wê dane.

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe em bi xu ne baş bîn? U zerrerê bigehînîn gîanê xu?

Min guh lê bî hindek miruv ḧeta tifa xu nada'îrin heker bi rojî ne.

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe pêtivî ye ez pitir zêde bikim da Xwidê razî bit? Ma Xwidê bi vî awayî turre ye? Yan belê hindek miruv dijî êk u dû pêşbezî dikin da bizanit kî qanûnîtir e ji ḧemîa?

Wextê ez li Kurdistanê jîam, min dîtin hindek pencerkêt xwaringeha bi rojnama girêdaî ne da rêbar yêt rojî ne bînin ka kî ne bi rojî ne. Belê min çend biçîk jî dîtî ne bi rojî ne bu cara êkê u rojîêt xu bi temamî digirin.

¿ ? Erê rojî tiştek e em bu miruvêt dî dikîn (u ew miruv dê bu me kirin xêr yan dê me hêne sizadan)? Yan rojî tiştek e em bu Xwidê dikîn (u Xwidê dibînit em çi bi dizîkî ve dikîn)?

Li demê Remezanê cilkêt jinka u kiçka bi sitartir in u ew mikîac nadeynin. Belê heker ne Remezan bit, hiçikêt wan piç piç korttir u dîwendartir dibin u kumlik u penterrun yêt wan tengtir dibin u mikîac u pirrç yêt wan dîartir in. Erê bab u mêr u bira çavêt xu li ser jinka u kiçka digerrînin u bu wan feriq nîne gel çi kesê hebit. Zelam u kurr jî seḧ dikin reqîsê u bê guman hizirêt wan ne li ser jinêt wan in.

¿ ? Erê ew zelam qedirê jinêt xu u Xwidê digirin? Erê hêjaîyêt me ji televizîunê u ji ḧemî tişt li ser internetê birîar dit u me divêt bizanin çend em dişêîn di jîana xu da xilas bîn (yêt gunneh e)? Yan hêjaîyêt me wekî hêjaîyêt Babê me li esmanê (ku em çêkirîn u ku ḧe ji me dikit u ku qodiret da me da em bişêîn ferqîê bikîn)? Yan hêjaîyêt me wekî hêjaîyêt xirabîê ku divêt hêlûyî me vegerînit ḧeta em bêjîn, "Ma vêca eve ne baş e" – da em bimînîn li gel wî her u her u diçîn cehnemê pêşve biçîne def Bab (Xwidê) ku pîruz e?

"Demê hîn rojîa digirin nav çavêt xu têk ne din, herweku dûrî dikin, çunku ew nav çavêt xu têk din da bu xelkî dîar bikin, ku ew bi rojî ne. Bi rastî dibêjime we, wan xelatê xu wergirtî ye. Belê demê tu rojîê digirî dêmê xu bişu u serê xu run bike, da bu xelkî dîar ne bit tu yê bi rojî, belê bu Babê xu yê neberçav, Babê te ewê nepenîya (bi dizîkî ve) dibînit, dê te xelat kit."
- Mizgînî ya Mettî 6:16-18

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.